K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkiyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

# **“Di Gotinên Pêşiyên Herêma Sirûcê de Teswîra Jinê”**

Xwendekar:

Abdurrahman Aydoğdu
19721004

Şêwirmend:
Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn 2021

# PÊŞGOTIN

Di vê sedsalê de -gotinên pêşiyan jî tê de- tev daneyên devkî yên folklorîk ji bo lêkolîneran bûne sedema hînbûna jiyîna gelan. Bi her daneyê, bi her hêmaya tiştekî devkî çawaniya jiyanên berê, nerîta di nav gel de bi her awayî xuya bûye. Hem ji ber vê sedemê, hem ji ber dewlemendiya çanda devkî ya bi kurdî lêkoler li ser vî warî hûr bûne; herwiha ew dane hem ji bo xebatên nû bûne argument, hem ji lêkolînên nû bûne nîşane. Bêşik gotinên ku şîret didin, yên ku li ser tecrûbeyekê tên gotin jî girîng in ji bo vê meseleyê.

Gotinên pêşiyan bi pêwendiyên civakî çêbûne û dîroka wan belkî wek 'dahêna axaftinê' kevn e. Ew îfadeyên bi giştî kurt, ên car caran bi rêzbend li dor felsefeya jiyana civakê ava bûne. Ji ber ku jiberbûna wan jî hêsan bûye li gorî meseleyekê çi qenc e çi neqenc e, şiroveya bûyerekî divê çawa be; wan ew nirxên hevpar derxistine pêş me û roleke nîşandana rêyekê girtine. Wan gelek caran rasterast ew rê nîşan dane, rasterast hizra gel anîne ziman; car caran jî wateyên kûr hewandine û bi wî awayî ceribandinên pêşiyan derxistine li ber nifşên nû.

Her wekî ku tê zanîn xebatên bi kurdî yên li ser gotinên pêşiyan bi serkêşiya Law Reşîd destpê kiriye û bi çapa xebatên cûr bi cûr heta niha di vî warî de lêkolîn û berhevokên berçav derketine holê.

Bi wesîleya vê projeye me di serî de gotinên pêşiyan bala min dikşand bi vê mebestê me xebateke sahayî di derbarê gotinên pêşiyan de kirî ye. Di vê xebatê de 4.500 gotinên pêşiyan min berhev kir û wek pirtûk bi navê gotinên pêşiyan di weşanên na yê de min da çap kir.

Ji bo vê projeyê li qadê di nav gel de, bi kal û pîran re em axivîn û li herêma Sirûcê gund bi gund, mal bi mal, derî bi derî em ketin pey wan gotinên qalibgirtî û şîretdar yên li ser jinan. Kê ji me re çi got me ew tev li ba xwe nîşe girtin. Ev proje bi lêkolîneke qadê me berhevkir. Ji bîrên kal û pîrên berê û hê jî zindî me yekser ew gotinên li ser jinan ji wan wergirt û di vê projeya xwe de peşkeş kir. Armanca vê projeya me ew ku me nexwest ku bila ev gotinên me yên pêşiyan bi kal û pîrên me re biax bibin. Ji bo vê jî me ji gund û malên ji hev cuda ev gelek gotinên ciyawaz û versiyonên wan me berhev kir. Bêguman me di vê xebata xwe de gencîneyek derxist holê. Ji ber ku li gor me gotinên pêşiyan gencîneyeke Kurdan e, heta ew gencine dernekevin li ser rûyê erdê bêwate dimînin ji ber ku heta ew gotin dernekevin li ser rûyê erdê kes ji wan agahdar nabe û jê sûdê wernagre.

## KURTE

Ev xebat di gotinên pêşiyên herêma Sirûcê de li ser teswîra jinê hatiye kirin. Heta niha li ser gotinên pêşiyan xebatên cûr bi cûr hatin kirin lê wek beşekê di gotinên pêşiyan ên herêma Sirûcê de li ser teswîra jinê heta niha tu xebat nehatiye kirin. Me jî di vê xebata xwe de hewl da ku ka di gotinên pêşiyan yên herêma Sirûcê de jin çawa hatine teswîr kirin. Me ji bo vê jî gotinên ku berhev kir me yek bi yek şîrove kir da ku ji bo çi hatine gotin baş bê zanîn.



**Peyvên sereke:** Gotinên pêşiyan, teswîra jinê, herêma Sirûcê

# ÖZET

Bu çalışmada Suruç bölgesine ait atasözlerinde kadın tasviri üzerinde durulmuştur. Bugüne kadar atasözleri üzerine birçok çalışma yapılmıştır ancak Suruç bölgesine ait atasözlerinde kadın üzerine hiçbir çalışma yapılmamıştır. Biz de bu çalışmada Suruç bölgesine ait atasözlerinde kadın tasvirinin nasıl yapıldığını göstermeye çalıştık. Atasözlerindeki kadın tasvirini detaylı bir şekilde ortaya koymak için çalışma kapsamında elde edilen atasözlerini tek tek inceleyip yorumladık.

**Başlıca kelimeler:** Atasözleri, kadın tasviri, Suruç bölgesi

# NAVEROK

PÊŞGOTİN........................................................................................................II
KURTE........................................................................................................III
ÖZET........................................................................................................III
NAVEROK ........................................................................................................ IV
DESTPÊK ........................................................................................................1

**BEŞA YEKEM**

**PÊNASE Û TAYBETMENDİYÊN GOTİNÊN PÊŞİYAN**

1.1. Gotinên Pêşiyan........................................................................................3
1.2. Pênase û Taybetmendiyên Gotinên Pêşiyan..............................................3
1.3. Tesnîfa Gotinên Pêşiyan.............................................................................5
1.4. Çend Xebatên Li Ser Gotinên Pêşiyan Ên Kurdî ......................................5

**BEŞA DUYEM**

**DI GOTINÊN PÊŞIYAN ÊN HERÊMA SIRÛCÊ DE TESWÎRA JINÊ**

2.1. Analîza Teswîra Jinê di Gotinên Pêşiyan ên Herêma Sirûcê de……………..12
2.1.1 Gotinên di derbarê eslê jinê de ..................................................................13
2.1.2 Gotinên di derbarê biçûkkirina jinê de .......................................................13
2.1.3 Gotinên di derbarê fedîkirina jinê de..........................................................14
2.1.4 Gotinên di derbarê sebra jinê de.................................................................15
2.1.5 Gotinên di derbarê xweşikbûna jinê de .....................................................15
2.1.6 Gotinên di derbarê hêz û rêvebirina jinê de ...............................................16
2..1.7 Gotinên di derbarê hêjayiya jinê de...........................................................17
2.1.8 Gotinên di derbarê berawirdiya jin û mêran de..........................................18
2.1.9 Gotinên di derbare bûk û xwesûyê de .......................................................19
2.1.10 Gotinên di derbarê başbûn û nebaşbûna jinê de........................................19
ENCAM ........................................................................................................20
ÇAVKANİ ........................................................................................................21

# DESTPÊK

Ger mirov bixweze miletekî nas bike divê mirov serî li gotinên pêşiyên wî miletî bide. Ji ber ku gotinên pêşiyan jiyan, çand û dîroka miletan nişan dide. Li ser vê îdeayê ev xebat amade bûye û naveroka vê li ser di gotinên pêşiyan yên herêma Sirûcê de teswîra jinê ye.

Me di vê xebata xwe de hewlda ku teswîra jinê di gotinên pêşîyan yên herêma Sirûcê de tesbît bikin. Her gotinek li gor nêrînên miletan û li gor tecrûbeyan tên holê û ji bo vê jî mirov bi hêsanî dikare bibêje her gotinek pêşiyan parçeyeke ji jiyana kesên ku mirov li wir gotinên pêşiyan perhevkirî ye. Ji ber ku gotinên pêşiyan li gor jiyana mirov û li gor tecrûbeyên mirov yê bi salan derdikevin holê. Me jî ev xebata xwe di nav gelê Sirûcê de bi hevpeyvînan kom kir. Em bi kal û pîran re rûniştin wek hevpeyîn me ji wan gotinên pêşiyan pirsin kê ji me re çi digot me li ba xwe dinivîsand. Bi vî awayî me berhevkariya xwe temam kir.

**1.Mijara xebatê û sînorên wê:**

Ev xebat, di gotinên pêşiyên yên herêma Sirûcê de teswîra jinê dihewîne. Em xebat li herêma deşta Sirûcê hatiye kirin wek sînor ev xebatê tenê li nav deşta Sirûcê hate kirin.

Ew gotinên di vê xebatê de hemû parçeyeke ji jiyana Sirûciyan e. Em ê di vê xebata xwe de bibînin ku ka di gotinên pêşiyan yên Sirûcê de jin çawa hatine teswîrkirin. Di kîjan rewş û bûyeran de ji bo jinan çi tê gotin û çîrokan wan çi ye. Em ê hemûyan yek bi yek bibînin û şîrove bikin.

**2.Armanca xebatê:**

Armanca lêkolîna me ew e ku em ji hêmanên çanda gel gotinên pêşiyan ên li herêma Sirûcê binirxînin. Armanca me ya sereke berhevkirin, dabeşkirin û vekolîna gotinên pêşiyan ên herêma Sirûcê ne. Li herêma Sirûcê, gotinên pêşiyan ên ku heta niha têra xwe nehatine vekolandin bi vê xebatê me hewl da ku em wan berhev bikin û bîbînin ka jin di van gotinan de çawa hatiye teswîr kirin em ê analîz bikin. Dema kal û pîrên me dimirin hemû agahiyên ku dizanin bi xwe re dibin. Lewra bi berhevkariyê me hewl da ku gotinên pêşîyan bi mirina kesan re nemirin û ji bo nifşê nû werin veguhestin. Em di wê baweriyê de ne ku lêkolîna me dê bibe çavkaniyek ji bo lêkolînên din ên di vî warî de

**3.Rê û rêbazên xebatê:**

Beriya her tiştî ev xebata berhevkariyê bi riya hevpeyvîn li gel hin kesan ku em digel wan kal û pîran re rûniştin hate kirin. Ji bo hevpeyvînan em ji malê derket çûn cîranan ji cîranan çûn mala hogir û hevalan ji wir çûn gundan kê ji me re çi digotin me yên dikaribûn hema li ba xwe binivîsanda me dinivîsî yên me nikaribû li ba xwe binivîsanda jî me bi telefona xwe ew deng tomar dikirin paşê em dihatin malê me ew deng guhdar dikir û ew gotinên ku ji me re hatin gotin bi tevî şîroveya wan li ba xwe dinivîsand.

**4.Pirsgirêkên xebatê:**

Di gotinên pêşiyan de pirsgirêka herî mezin ev e ku hinek kal û pîrên me henin ku ji ber mezinbûna temenên wan dema ji me re gotinek digotin pir caran hinek peyv an kêm, an jî şaş digotin ji ber ku hinek gotin henin ku her tim nayê gotin loma jî ji wextekê şunde ji bîr dibe û nayê bîra mirov. Ev jî dema berhevkariyê ji me re dibû asteng her wiha dema em diçûn ba hinekan kesan ne dixwestin bi me re biaxiviyan û ji me re gotin bigotinan. Ji ber ku hinekan fedî dikirin hinekan jî xebata me wek tiştekî vala didîtin û loma jî nedixwestin di derheqê vê mijarê de bi me re biaxiviyan. Wekî din jî pirsgirêka vê xebatê û berhevkariyê ev e ku divê tu bigerî biçî nav gund û malan. Dema erebeya mirov tune be ev kar dijwartir dibe. Ya me jî erebeya me tunebû ji ber vê jî em nikaribûn bi hêsanî biçûna nav gund û malan loma jî ev mijar di vê rewşê de ji me re dibû pirsgirêk.

Her wiha pirsgirêkeke din ya sereke jî ev e ku mirov nikare bibêje ev gotin aîdî vê herêmê ye mînak “Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e.” Mirov biçe kîjan herêmê jî dê ev gotin bê gotin ji bo vê jî di xebate berhevkariyê de wek aîdîtî tiştekî misoger tune ye. Lê dîsa jî ji ber ku me navê xebata xwe wek di gotinên pêşiyan yên herêma Sirûcê de teswîra jinê nişan daye em ê çi gotinên li vê herêmê tê gotin wan gotinan wek gotinên vê herêmê bihesibînin. Ev jî pirsgirêkek e, ji nîqaş û rexneyê re jî vekirî ye…

# BEŞA YEKEM:

# PÊNASE Û TAYBETMENDİYÊN GOTİNÊN PÊŞİYAN

Gotinên pêşiyan ev tişt in ku çand û jiyana mirov yên bi salan heta roja me ya îro hatî bi gotinên qalibgirtî rave dike. Gotinên pêşiyan her yek li gor tecrubeya mirovan derdikeve holê. Berê bav û kalên me li ser hinek mijar û bûyeran bûne şahid, dîtine ku ev mijar çawa destpêkirî û qediyaye ji van bûyer û mijaran tecrûbe girtine û li gor van tecrubeyan gotinên xwe yên qalibgirtî anîne ziman. Em ji van gotinên ku bi tecrubeyan derketine holê û yên qalibgirtî re dibêjin gotinên pêşiyan.

## 1.1. Pêneseya Gotinên Pêşiyan:

Di derheqê gotinên pêşiyan de gelek pênaseyên curbicur hatine kirin. Bi gelemperî em dibînin ku gotinên pêşiyan bi tecrubeyên salan derdikevin holê û ew gotinên qalibgirtî ne. Di gotinên pêşiyan de şîret henin û gotinên kurt in. Her çiqas kurtbin jî bi wateya ku di xwe de dihewîne ewqasî dirêj in. Em ê niha binêrên ka di derheqê gotinên pêşiyan de kê çi gotî.

Li gor keskîn gotinên pêşiyan ev gotinên qalibgirtî ne ku di nav demên dûr û dirêj de heta bi roja me hatine û rewş û têkiliyên civakê bi me didin nasîn. Wek cureyên din ên edebiyata gelêrî bi demê re afirînerê wan ji bîr bûye û loma di nav gel de bi awayekî anonim û kolektif hatine gotin û veguhestin. (Vgz. Keskin, 2019, r.297) Loma gotinên pêşiyan ne yê kesan e, yê gelan hemûyan e. Ji berê de ji aliyê bav û kalan ve hatiye gotin û xwediyê jî ne dîyar in. Gotinên pêşiyan malê gel bi xwe ye.

Li gor Ozkan gotinên pêşiyan ya ku taybetmendiya anonim di xwe de dihevîne, tê qebûl kirin ji bav û kalan maye û ji ceribandina civakê ya sedsalan a gotin û ji ceribandinan, fikra hevpar, bi helwest û tevgeran ji ya fikra dinyayê pêk hatî, wek qaîdeyên giştî, kin, sade, gotinên qalibgirtî ne. (Özkan, 2011, r.1135) Gotinên pêşiyan ev tişt ên anonîm im ku yên malê gelan in gotinên kurt û qalibgirtî ne.

Li gor Kizil gotinên pêşiyan dikare mîna gencîneya gelekî bê dîtin. Lewra ew taybetiyên gelekî herwekî jiyan, dîrok, serpêhatî, tecrube, bawerî dihewînin. Heke xebateke baş li ser van gotinan bê amadekirin dê bê dîtin ku hin ji van ji pirtûkên pîroz, hin ji van ji serpêhatî, tecrubeyên rojane, hin ji van jî gotinên mirovên zîrek û xwedî hîkmet in. (Kızıl, 2018, r. 583) Wek Kizil jî dibêje gotinên pêşiyan mîna gencîneyan e. Taybetmendiya civakan di xwe de dihewîne.

Li gor keskîn gotinên pêşiyan di kurdî de li gorî zaravayan bi çend peyvan tên binavkirin. Di kurmancî de wek gotinên pêşiyan, gotinên mezinan, di zazakî de vateyê verênan û di soranî de jî wek pendê pêşiyan tê bikaranîn. (Vgz. Keskin, 2019, r.297) Di derheqê gotinên pêşiyan de gelek xebat hatine kirin ji wan xebaten: “Navê yekem xebata kurdî ya derbarê gotinên pêşiyan ên kurdî jî Kürtlerde Dûrub-î Emsal a Law Reşîd e.” (Vgz. Keskin, 2019, r.297)

Li gor Alakom gotinên pêşiyan beşeke grîng ya folklora Kurdî pêk tîne. Ji van gotinan re carcar bende pêşiyan jî dibêjin. Ev berheman carcar jî mesele û metelok tên binav kirin. Gotinên pêşiyan yên kurdî gelek dewlemend û rengîn in, ji wan beşek şaxê wan yên cida jî henin. Heta niha hemû gotinên pêşiyan di nav kurdan de nehatine berev kirin, nehatine şîrovekirin û li ser wan xebatên zanistî û folklorî nehatina pêkanîn. Gotinên pêşiyan wek felsefeya jiyîna gelê kurd gelek zanyarî û agahdariyên giranbiha pêşkêşî me dikin. Bi taybetî di warê pêwendiya civakî û mirovî de, ev gotinên kurt, têr û tijî menekûr, gelek şîretan li me dikin. (Alakom, 2002, r.41)

Gotinên pêşiyan bi piranî li ser rûdanekê, li ser serpêhatiyekê hatine gotin û loma her yek ji wan xwedî hikayeyekê ye û ji ber vê yekê jî tecrubeyeke kolektif vedihewîne. (Vgz. Keskin, 2019, r.298) Dema mirov li gotinên pêşiyan dinêrê ji aliyê xwîneran ve dibe ku tenê wek wateya wan bê dîtin. Lê gelek gotin çîrokên xwe jî henin. Dema lêkolîner lêkolîna xwe dike ji kesên ji wan re gotinên pêşiyan dibêjin bi tevî cîrokan wan ew gotinan ji lêkolîneran re dibêjin. Û tiştekî din yê balkêş ev e ku hinek gotin herêmîne û li ser wan herêman wate û çîrokên xwe yên taybet jî henin.

## 1.2.Taybetmendiyên Gotinên Pêşiyan:

Di pirtûka Necat Keskîn ya bi navê Folklor û Edebiyata Gelêrî de wisa neqil dike ku Kadrî Yildirim dibêje li ser gotinên pêşiyan gelek pênase hatine kirin lê bi kurtasî wek ku Kadrî Yıldırım dibêje; “Gotinên qalibgirtî yên ku di demên berê de ji aliye pêşiyan ve hatine gotin û ceribandinên wan ên curbicur nişan didin û nifş bi nifş heta roja me hatine neqilkirin wekî “gotinên pêşiyan” tên binavkirin.” Pênaseya nêzî vê yekê jî ji hêla Mustafa Öztürk ve hatiye kirin. Li gorî Öztürk gotinên pêşiyan; texlîdeke ji wêjeya gelêrî ye ku serborî, tecrûbe û rabirdûya civakan bi awayekî zargotinî û bandor rave dike.

Li gorî agahiyên jorîn û pênaseyên wan taybetmendiyên gotinên pêşiyan bi vî awayî dikarin bên rêzkirin:

Taybetmendiya herî sereke ya gotinên pêşiyan qalibgirtîbûna wan e. Loma di nav vê risteyê de peyvên ku hatine bikaranîn nikarin bên guhertin. Wekî Öztürk jî dibêje: Gotinên pêşiyan, ji teşeyên qalibgirtî pêk tên. Ji ber ku rawestar in, teqez meriv nikare bêjeyên wan bi yeka din biguherîne. Di gotina "Sifra merdan tim raxistî ye." De bêjeya "raxistî ye" nêzwateya bêjeya "amade ye" de nayê guhertin. Lê dîsa jî ji ber qalibgirtina van vegotinan em nikarin vê bêjeyê yan yeke din bi kar bînin. (Vgz. Keskin, 2019, r.299-300) Di gotinên pêşiyan de fikra gel ya hevpar, nêrîn û têgihiştina wan dikare bê dîtin. Nirx û darazên civakî vedihewîne. Gotinên pêşiyan dîdaktîk in, şîretekê li mirov dikin an dersekê didin. (Vgz. Keskin, 2019, r.300)

Gotinên pêşiyan di hinek çandan de roleke civakî jî digirin ser xwe. Gotinên pêşiyan bi piranî ji aliye ziman ve xwedî nasnameyeke netewî ne. Ligel ku cureyên vegotinê yên din dikarin di nav zimanan de herin û werin, gotinên pêşiyan ji bo zimanekî din dikarin bên wergerandin. Li gel vê yekê varyantên wan di zimanên din de û herweha di nav heman zimanî de dikarin bên dîtin ku li gorî binyada wî zimanî hatine sazkirin. Wek Uğur Başaran jî dibêje: "Gotinên pêşiyan, dikare li gorî dem, erdnîgarî, zayend, ol, torê hwd. Bi cur bibin. Di encama vê cûrcicûrbûnê de jî, dikare gelek waryantên gotinên pêşiyan yên di heman rengî de derdikevin holê. Pêkan e ku heman gotineke kevneşopî ya di hişê mirovekî de, di hişê yekî din jî de hebe. (Vgz. Keskin, 2019, r.300)

Her wiha mirov dikare bibêje ku hinek gotinên pêşiyan wateyên xwe heman in lê dema di zimanekî din de tê gotin peyvên xwe diguhere. Mînak di tirkî de gotina pêşiyan ya ku dibêje "Damlaya damlaya göl olur" heye di gotinên pêşiyan yên kurdî de varyantên vê gotinê yên ku ji hev cuda henin ku ev jî ev in "1:Gûzek gûzek dibe dîzek. 2: Nanik nanik bû arvanik. 3: libo libo, dibe qubo. 4: Hindik hindik gihişt gundik. 5: Piçik piçik diçe kuçik" belê wek vê mînakê gelek gotinên pêşiyan li gor netew û zimanên din diguhere û varyantên wê yê ji hev curbicur henin.

Wek cureyên din ênedebiyata gelêrî gotinên pêşiyan jî di rewşa civakî çandî ve girêdayîne. Loma dibe ku hinek gotinên pêşiyan ne li gorî "îro" bin û dibe ku li gorî îro di nav jiyana me de cih digire înternet û teknolojî ye û wek her tiştî bandorê li cureyên edebiyata gelêrî jî dikin û wan diguherînin. Her çiqasî ji bo yên kurdî mînakên xebata tune bin jî di tirkî de mînakên bi vî rengî tên dîtin. Tora medya civakî di vî warî de mînakên balkêş nişan dide. Wek mînak di tora civakî de gotineke pêşiyan ya bir ipte iki ayı oynamaz guheriye û bûye aynı IP'de iki bilgisayar oynamaz" (Vgz. Keskin, 2019, r.301)

Di derheqê gotinên pêşiyan de Samî Tan di pêşigotina pirtûka Mehmet Oncu ya bi navê gotinên pêşiyan de weha dibêje: "Dema ku mirov bixweze gelekî nas bike, mirov divê bala xwe bide çand û zimanê wî gelî. Nemaze biwêj û gotinên pêşiyan di vî warî de pir girîng in. Wekî din jî xweşî û dewlemendiya zimanekî ne tenê bi gotin û rêzimana wî, bi biwêj û gotinên pêşiyan jî diyar dibin. Ziman bi alîkariya biwêj û gotinên pêşiyan xweşik û zindî dibe. Biwêj û gotinên pêşiyan xeml û rewşa zimanekî ne." (Oncu, 2009, r. 5)

## 1.3.Tesnîfa Gotinên Pêşiyan:

Tesnîfa gotinên pêşiyan dikare bi gelek awayan bê kirin. Ji hêla civakî, ji hêla naveroka van, ji hêla teşe û wateyên wan ve gotinên pêşiyan dikarin bên polînkirin. Wek mînak, Pertev Naîlî Boratav gotinên pêşiyan ên tirkî wek; 1) gotinên pêşiyan ên eslî û 2) biwêjên di nirxên gotinên pêşiyan de polîn dike.

Derbarê polînkirina gotinên pêşiyan ên kurdî jî heta niha hinek ceribandin hatine kirin. Lê divê di serî de navê Law Reşîd û polînkirina wî bê gotin ku wek yekemin xebata zanistî ya derbarê gotinên pêşiyan ên kurdî jî dikare bê nirxandin.

Law Reşîd di hejmara Jînê yên 3-4-5-7-8an de li ser gotinên pêşiyan ên kurdî rêzegotarek bi navê Kürdlerde Durub-i Emsal nivîsandiye. Di vê rêzegotarê de Law Reşîd li gorî mînakên berdest tasnîfek kirî ye. Di destpêka xebatê de Law Reşîd dibêje ku gotinên pêşiyan ji aliyê forma îfadekirinê ve dereceya kamilbûna ziman û ji aliyê wateyê ve jî rewşa civakên ku wan dibêjin nişan dide û loma jî pir girîng in. Ji ber vê yekê jî 100 gotinên pêşiyan berhev dike û tesnîf dike. Law Reşîd ji vê tasnîfê armanca xwe weha tîne ziman; ji berhevkirin û tomarkirina wan mabest, xizmeteke biçûk bo zanyaran e û hewldaneke ji bo ku ev gotinên ku faktorên civakî ne ji hafizeya millet têk necin. (Keskin, 2019, r.301-2)

Bêguman her gotineke pêşiya yekten ji devê yekî/yekê ji nişka ve derneketiye. Her gotineke pêşiya, serpêhatî û çîrokeke wê heye, di dawiya bûyerek giring de peyda bûne. Pêwistî û hewcedarîkê ew afirandine. Dema em tecrûbe û ceribandinên mirovan yên sedsale jî, li ser van etaban de zêde bikin, wê çaxê mirov dibîne ko her gotineke pêşiya li ser bingehên ked û zehmetekî aqilmendiyê peyda bûye, for- ma xwe ya dawî wergirtiye (Alakom, 2002, r. 42)

# BEŞA DUYEM

# DI GOTINÊN PÊŞIYAN ÊN HERÊMA SIRÛCÊ DE TESWÎRA JINÊ

Gotinên pêşiyan bi tecrubeyên salan derdikevin holê û ew gotinên qalibgirtî ne. Civakan gelek nêrînên xwe bi gotinên pêşiyan anîne ziman. Lewra gotinên pêşiyan gelek sembolên zayenda civakî di nava xwe de dihewînîn. Yek ji van jî teswîra jinê ye. Di gotinên pêşiyan de jin ji gelek alîyan ve hatiye teswîr kirin. Di hin gotinan de jin hatiye bilind kirin, di hin gotinan de jî hatiye nizim kirin. Em ê di vê beşê de analîza gotinên pêşîyan ên herêma Sirûcê bikin

## 2.1. Analîza Teswîra Jinê di Gotinên Pêşiyan ên Herêma Sirûcê de

Em ê di vê xebatê de bibînin ku ka di gotinên pêşiyan yên Sirûcê de jin bi çi şiklî tên teswîrkirin û her wiha em ê di gelek gotinan de mînakên ku yên pesna jinê dide û yên jinê biçûk dixe bibînin.

Ev gotinên ku pesna jinê didin û yên jinan biçûk dixe bi çi şiklî û bi kîjan gotinan hatine ziman em ê bi mînakên gotinên pêşiyan yek bi yek bibînin. Kîjan gotin ji bo çi rewş û bûyerê û bi çi awayî hatine ziman em ê bi tevî şîroveya wan peşkeş bikin.

Di nav gotinên pêşiya yên kurdî de, beşeke wan çawa em dibînin li dora tema jinan berev û lod dibin, bi sedan gotinên li ser jinan di zimanê kurdî de hene. Ev loda gotinên pêşiya derbarê rewşa jinan de, gelek agahdariyên sosyolojîk pêşkêşî me dikin. Bi saya van gotinên pêşiya mirov xwe bi hêsanî dirêjî serboriya civata kurd dike, pêwendiyên jin û mêran, rewşa malê, malbat û jinê çêtir analîz bike. Bi vî tehrî, em van berhemên folklorîk ji xwe re dikarin bikin pêlekan û li ser rewşa jinên kurd bighêjin çend encam û nêrînên sosyolojîk û etnografîk. Dîsa bi saya van gotinan em dikarin xwe wek civat baştir binasin û bidin nasandin. Ew wek neynikekê ne, bi her aliyan ve dikarin civata kurdî bînin ber çavan. (Alakom, 2002, r.41-42)

Her gotineke pêşiya ya li ser jinan, raste-rast rewşa jinan tîne zimên. Beşek ji wan jî, rewşa jinan dane ber çavan, lê belê li ser tiştên mayî hatine gotin û wan tînin zimên. Ji ber ko li ser tema jinan şax vedane û jin ji xwe re kirine bingeh, ev beşa duwemîn ya gotinên pêşiya dîsa jî bala mirovan vedigerînin li ser rewşa jinan, wek misal dema mirov dibêje qîz mêvanê malê ye, mirov dixwaze bibêje keçek nikare heta mirinê di malê de bimîne, ji aliyê din ji bona

tiştên derbazok jî mirov dikare vê gotina pêşiya bi kar bîne. Dema mirov tenê vê mana duwemîn bide ber çavan, kok û binyata peydabûna vê gotinê mirov nikare (wek rewþa keçan) bavêje alîkî. Ev kok û binyatên çend gotinên pêşiya jî, bona ronîkirina vê analîza me ya li ser jinan gelek rênîşandar û kêrhatî bûne. Ji aliyê din, ji der gotinên pêşiya, ji bo xurtkirina çend nêrîn û baweriyên xwe, me ji ferhenga hevbêjeyên (tabîr) kurdî jî gelek îstîfade kir. (Alakom, 2002, r.42)

Di nav hevbêjeyên kurdî de, gelek hevbêjeyên derbarê jinan de hene, wek gotinên pêşiya rê nîşanî me didin. Bi sedan gotinên pêşiya yên kurdî nîşan didin ko civata kurd giringîke mezin daye jinan û babeta jinan. Li her heremê angorî zarav û devokan şax û guhartokên wan jî hene. Hemberîhevkirin, danberhevîna wan bêguman gelek balkêş û kêrhatî ye (Alokom, 2002, r.42) Em ê niha van gotinên balkêş yek bi yek binêrin.

### 2.1.1 Gotinên di derbarê eslê jinê de

**Avê bîne ji kaniyan, jinê bîne ji ‘esliyan:**

Wek gelek herêman li Sirûcê jî dema keçek tê xwestin girîngiyê didin xwediyê wê keçê. Keçeke ku ‘eslê xwe, cihê ku jê hatibe diyar be ew keç jî wek cihê xwe û ‘eslê xwe baş dibe. Di vê gotinê de peyama ku tê dayîn hesasiyata kurdan ya derbarê jinxwestinê de tîne ziman. Divê mirov ji her derê û ji her kesî jinan nexwezin. Bila bedewiya jinên ku tê xwestin bila ‘esl û malbata wê be.

**Jina bînin ji malan, xwarzî herin li xalan:**

Tê gotin ku dema jinek hat xwestin bila ji malake bi nav û nas be, da ku bila zarok li xalê xwe bên. Ji bo ku bila zarokên mirovan jî wek xalên xwe baş bin.

### 2.1.2 Gotinên di derbarê biçûkkirina jinê de

**Bila stûna malê xwar be, bila jina malê ne har be:**

Dema mirov bi çavekî nêrîna civakê ya li ser zayendê binêre dibîne ku di gelek gotinan de jin biçûk tê xistin ji wan gotinan yek jî ev e ku jinê wek har nişan dide û ev gotin feraseta civakê ya li hember jinê derdixe holê. Jina har li gor çi tê teswîr kirin? Ji gelek aliyan ve bersiva vê pirsê hebe jî dîsa bersiva ya herî di cih de mirov dikare bi hêsanî bibêje jina har li gor vê

gotinê ev e ku ya bi gotina mêrê xwe nake, rast an şaş li gor xwe tevdigere û li hemberê mêrê xwe derdikeve. Di vê gotinê de ji bo jinên wisa re har tê gotin.

Lê dema em li gor rewşa îro bi nêrînan jinan ve vê gotinê binirxînin jin vê gotinê wek tiştekî tund û biçûkxistinê dibînin bi tu awayî vê gotinê qebûl nakin. Şîroveya mêran ya ku dibêjin jin bi gotina mêrên xwe nakin an jin li hember mêrên xwe derdikevin vê mijarê jî ji bo jinan wek "Jina azad" tînin ziman. Lê bi gelemperî wek encam û li gor gotinê mirov dikare bibêje mala te û jiyana te çawa dibe bila bibe, lê bila tenê jina te ne har be. Bila jina te yeke rihet be…

**Jin dara şikestî ye:**

Di nav civata me de jin tim biçûk tê dîtin û wek barekî ye. Loma jin gotinên bi vî rengî yên jinan biçûk dixin henin.

**Jin bimire mêr jar dibe, mêr bimire jin har dibe:**

Tê gotin ku mal ji mêran xera nabin ji jinan xera dibin. Dema jina mêrekî bimire mêr ji karê malê fêhm nake, perişan dibe û nizane çi bike. Lê dema mêr dimire jin hinekî bêhtir azad dibe. Av azadbûn jî di nava civaka me de wek har hatiye nîşan dan.

**Heger jina te sernerm be, wê şîva te êvarê germ be,  lê heger jina te serhişk be, wê di hundir da wek dûpişk be:**

Gotineke mêran ya li dijî jinê! Di gelek gotinên pêşiyan de tim dixwazin bila jin di bin gotina mêran de bin, ger jina ku ne di bin gotinan mêrê xwe de be wek di vê gotinê de jî diyar e ku wek dûpişk, ser hişk û hwd. Tê nîşan kirin. Ev jî rastiya gel ya li hember jinê nişan dide.

## 2.1.3 Gotinên di derbarê fedîkirina jinê de

**Fedîkirin li mêran, ken li janan nê:**

Di nav civata me kurdan de tim tê xwestin ku bila jin dengê xwe nekin û bila li her derê bêdeng bin. Ji bo mêran jî dixwazin ku bila mêr ne fedok bin. Li ser vê gotinê em dixwazin bibêjin ger mirov bixweze rastiya civakekê binase divê pêşî mirov serî li gotinên pêşiyan yên wê civakê bide. Ji ber ku gotinên pêşiyan rastiya civakan tîne ziman. Rastiya civakê ya di vê gotinên pêşiyan ev e ku tiştên ji bo mêran edet e, ji bo jinan jî qebahat e. Wek ku tê gotin "Mêrê fedok bi kundekî, jina fedok bi gundeki"

## 2.1.4 Gotinên di derbarê sebra jinê de

**Ha sebra jinê, ha bêriya bizinê:**

Bêriya bizinan zû xelas dibin. Di vir de dixweze bê gotin ku jin bê sebr in û sebra wan jî wek bêriya bizinan zû xelas dibin.

Me gotibû ku gotinên pêşiyan li gor tecrubeyên mirovan derdikevin holê, lê bi tecrubeya wan jî em di gotinên pêşiyan de jî dibînin ku ew gel ew civak bi çi karî re mijûl e jî derdikeve holê. Di vê gotinê de jî tecrube ew e ku bêriya bizinan zû xelas dibe. Di vê gotinê de em bi hêsanî jê fêhm dikin ku ev gel gelekî koçber e û diçin zozanan, pezan berdidin xozanan û bêrîvan jî diçin bêriya wan dikin û bi wan tecrubeyan ev gotin hatiye ziman…

## 2.1.5 Gotinên di derbarê xweşikbûna jinê de

**Heger jina te xweşik be, wê dilê te şik be:**

Xweşikî dilê mirov şik dike. Mirov bi tiştê xweş kêfxweş dibe. Di vê gotinê de peyama ku tê dayîn ev e ku ji bo mirov bixweze dilê mirov şik be pêwîst e ku mirov bi jineke xweşik re bizewice.

## 2.1.6 Gotinên di derbarê hêz û rêvebirina jinê de

**Ên ku malan xera dikin jî û ava dikin jî jin in:**

Jin bixwazin dikarin malan xera bikin û dema bixwazi dikarin malan ava jî bikin. Rola ku civat dispêre jinê gelekî mezin e. Carinan em di gotinekê de dibînin ku jin wek şêran, di gotineke din de jî jinê wek ji sed mêrî jî çêtir dibînin di gotineke din de jî em dibînin ku îcar jin biçûk hatiye xistin. Ev heman tişt di vê gotinê de jî heye. Ku jin yeke baş be dê malan ava bike, lê ku ne ya baş be jî dê malan xera bike.

**Avahiya malan di destên jinan de ye:**

Tenê yên malan dikin mal jin in. Ji ber ku yên malan çêdikin û didin hev jin in. Em ê di vê xebata xwe de bibînin ku di hinek gotinên pêşiyan de pesnê jinê dide û di hinek gotinên pêşiyan de jî jin biçûk tê xistin. Ji wan gotinên ku pesna jinê dide yek jî ev e. Çawa ku endezyarek dema avahiyekê ser kaxizê xêz dike û paşê jî dizayn dike jin jî wisa nin wek dizaynsazekî, wek endezyarekî mala xwe li gor xwe dizayn dikin û li gor vê jî hindurê malê didin hev. Hemû tiştên malê di destê jinan de ne, em dikarin bibêjin mêr qet mudaxile jinê nake. Ji ber ku avahi malan di destê jinan de ye.

**Jin derket ser serî, dê avêt ber derî:**

Di vê gotinê de dixweza bê gotin ku bawerî bi jinan nabe. Dema jin were cihekî mezin dikare hemû tiştên xwe yên pîroz ji bîr bike.

**Jin dikarin mêran rakin jî, wenda jî bikin:**

Carinan mirov dibîne ku hinek mêr henin ji tu tiştî re nabin dema dizewicin jina wî mêrî jineke baş derdikeve wî radike û ew mêr jêhatî dibe, tiştên ku mirov jê hêvî nake dike. Lê carinan jî em dibînin ku hinek mêr henin jina wan ne baş in mêr bi wê jinê re rezil dibe, mêrê ku berê jêhatî û bi serê xwe bû dema dizewice mirov dibîne ku ji destê jina xwe nikare bilive ji bo wan mêran jî di vê gotinê de tê gotin ku jin mêran radikin jî û wende jî dikin…

**Nîşe:** Bi gelemperî me di vê xebata xwe de şîrove û nirxandinên xwe li gor zewac û bûk û xwesûyan kir. Carinan hinek gotin henin ku care pêşî mirov dixwîne peyama ku dixweze bê dayîn fêhm nake ew jî taybetmendiya gotinên pêşiyan in. Ji bo hinek gotinan ku

mirov fêhm bike divê mirov di gotinên pêşiyan de zane û pispor be. Lewre pir caran hinek gotin henin ku cara pêşî mirov dibihîse ji bo mirov gotineke ji rêzikê û bêwate tê dîtin. Lê dema mirov bingeha gotinên pêşiyan bizanibe mirov dikare bi hêsanî peyama ku dixweze bê dayîn fêhm bike. Loma jî di vê xebatê de dibe ku hinek şîrove û nirxandinên me û gotinên pêşiyan ji hev cudabin jî lê dema mirov bi awayekî berfireh bifikire û bala xwe bide wan gotinan dê bibîne ku di gelek gotinên pêşiyên kurdî de peyamên veşartî jî henin.

**Jinan dil kir, dîwar qûl kir:**

Dema jin dil bike; tu astengî û sînoran nas nake. Hemû sînor û astengiyan bi hêsanî ji holê radikin.

## 2.1.7 Gotinên di derbarê hêjayiya jinê de

**Jin hurmet e:**

Jin hêja ye. Jin dayik e, dayik jî pîroz in tiştên pîroz jî bi hurmet in loma jî gotina jin hurmet e tê gotin.

**Jin jiyan e:**

Wek şîroveya jin hurmet e.

**Jin binyata xênî ne:**

Yên malan ava dikin jin in. Mal li ser pişta jinan e. Ji bo vê jî jin binyada malan e.

**Jin stûna malê ye:**

Di vê gotinên pêşiyan de jî em fêhm dikin ku karê malê hemû li pişta jinê ye. Çawa ku stûn peyvira rakirina barê malê dibîne jin jî peyvira rakirina karê malê dibîne. Ji bona ve jî: "Jin stûna malê ye..."

**Her jinek di mala xwe de xatûn e:**

Her kes li cihê xwe giran e. Îro jin heye ku li gundan dijî. Di karê gund de, dotina bizin, mî û çêlekan de pir baş in her karê gund dikin û wek xatûnan tê dîtin. Lê li cihekî din li bajarekî dibe ku ew jin ji ber ju nexwendiye û ne xwediyê pîşeyekî ye wek gundî û nezan jî tê dîtin. Ji bona vê jî her jinek di mala xwe de xatûn e.

## 1.2.8 Gotinên di derbarê berawirdiya jin û mêran de

**Jin keleh e, mêr girtî ye:**

Jin bixwazin dikare mêran dîl bigirin. Mêr çiqas bi hêz û mezin be jî nikare bi jinan re biçe ser. Divê mirov ji jinan her tiştî hêvî bike. Ne ku mirov bibêje mêr ji jinan hêztir û jin ji mêran bêhêz in û bi mêran nikarin…

**Şêr şêr çi jin e, çi mêr e:**

jêhatbûn û bi hêzbûn ne li gor zayendê ye. Carinan jinek bi sed mêrî ye.

**Axa jin û mêr ne ji hev be tev nagere:**

Wek beweriyekê jî tê dîtin ku dema kesek ji dayik dibe qedera wan jin û meran li hev tê birîn. Ji bo vê dema mirov bala xwe didin bûk û zavayan mirov dibîne ku dişibin hevdu.  Ji bo vê jî dibêjin ku axa jin û meran ne ji hev be tev nagere.

**Barê dinê li mêr e, barê mêr li jinê ye:**

Li dinyayê çiqas karê giran hebe mêr wî karî dike. Lê belê her çiqas mêr karê giran bike jî lê karê wî jî jin dike. Ji ber ku mêr nikare her karê xwe bike. Loma jî çiqas barê dine li mêr be, barê mêr jî li jinê ye.

**Agir zêr, zêr jin, jin jî mêr dihelîne:**

Di vê jiyanê de her kesekî ku ji tiştekî din bandordar dibin henin. Çawa ku agir zêr, zêr jin, jin jî mêr dihelîne. Di vir de mabesta herî ber bi çav jin e. Dixwaze bibêje jin mêran dihelînin. Di

nav gelek herêman de ev mabest ber bi çav e û jinan wek mêran dihelînin, ‘emre wan dixwin û kezeba wan reş dikin dibînin.

**Dara bi tenê, mîna mêrê ber hikmê jinê:**

Çawa ku dara bi tenê ji pir tiştî re nebe, mêrê di hikmê jinê de jî ji tiştekî re nabe. Di civakê de tim ev daxwez heye ku bila mêr serdest be û jin jî bindest be. Ev jî nîşanî me dide ku bi piranî di nav civaka kurdan de mêr serdest in loma jî tim gotinên ku dixwazin bila mêr serdest bin û jin jî bindest bin tînin ziman.

## 2.1.9 Gotinên di derbare bûk û xwesûyê de

**Dersê digire ji jinê, ji dê re dibe dijminê:**

Di civaka kurdan de gelek gotinên pêşiyan li ser zewac û jiyana nav malan e. Ev gotin jî ji wan yek e. Jixwe dema em li nav malan dinêrin tim derdê bûkan xwesî, derdê xwesiyan jî bûk in loma jî di gotinên pêşiyan de gelek gotinên bi vî rengî henin.

Di civaka me de piştî zewace kuran dema tevgerên kuran biguhere û li hember malbata xwe de an bertek nişan bide û tevgerên neyinî nişan bidin ew dem vî tiştî bi bûkê girê didin û wek jin dersê dide kurê wan û li hember malbatê re dike dijmin. Ev fikir bi piradî ji bo dayikan derbasdar in loma jî dibêjin Dersê digire ji jinê, ji dê re dibe dijminê…

## 2.1.10 Gotinên di derbarê başbûn û nebaşbûna jinê de

**Jin hem nûra çavan e, hem kula dilan e:**

Jinên xweşik dilê mirov xweş dike çavên mirov bi nûr/ronî dike. Lê dema mirov bibe evîndarê wê jinê û ew jin ji wî kesî hez neke ew dem dibe kula dilan.

Jin heye ji sed mêrî çêtir e: Me li jor jî gotibû ku hinek gotinên pêşiyan henin ku jinan biçûk dixin hinek gotinên pêşiyan jî henin ku jinan bilind dikin. Li ser mijara gotinên pêşiyan yên ku jinan biçûk dixin gelek nîqaş tên kirin. Ji aliyê gelek kesan ve fikrên pêşî yên di derheqê jinê de wek jinan biçûk dixe tê dîtin lê di vê gotinê de jî em dibînin ku her çiqas hinek gotinên pêşiyan yên jinê biçûk dixe hebe jî gelek gotinên pêşiyan yên ku pesna jinê dide jî heye. Di derheqê vê gotinê de em dikare bibêjin çawa ku her kes ne yek e jî, her herêm û her gel jî ne yek û wek hev in. Carinan li cihekî feresateke jinê biçûk dixe heye, li cihekî tin jî feraseteke ku jinê mezin dixe heye ev

# ENCAM

Di vê xebatê de em li ser di gotinên pêşiyên herêma Sirûcê de teswîra jinê sekinin. Xebata me bi temamî li herêma deyşta Sirûcê û di nav gelê Sirûcê de wek hevpeyvînan hat berhevkirin.

Me di vê xebata xwe de pêşî behsa pêvajoya berhevkirina vê xebata xwe kir. Mijara xebatê û sînorên wê çi ne me rave kir, ji bo çi me ev xebat kir û armanç û girîngiya vê xebata me çi ye, rê û rêbazên xebatê û pirsgirêka vê xebatê çi bûn me yek bi yek anîn ziman. Di beşa yekem de em li ser gotinên pêşiyan sekinin. Gotinên pêşiyan çi ne çawa derdikevin holê, pênaseyan wan û xebatên di derheqê vê mijarê de bi tevî lêkolînerên wan ve çibûn me yek bi yek nivîsî. Me di beşa xwe ya duyem de jî cih de gotinên pêşiyan yên ku di derheqê jinan de hatiye gotin û yek bi yek şîrove kir.

Di vê xebata xwe de me dît ku wek gelek herêman li Sirûcê jî gotinên ku pesnê jinan didin û yên ku jinan biçûk dixin henin.

# ÇAVKANÎ

Alakom, R. (2002). Folklor û jinên Kurd. Stockholm: Nefel.

Keskîn, N. (2019). Folklor û Edebiyata Gelêrî. İSTANBUL: AVESTA.

Kızıl, H. (2018). ÇAVKANİYÊN Jİ ÇANDA KURDÎ Dİ NÛRA QELBAN DE. Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi cild: 10, sayı:2, 584.

Oncu, M. (2009). Gotinên pêşiyan. İnstanbul: Weşanên Ensîtuya Kurdî ya Stembolê.

Özkan, B. (2011). Toplumsal Cinsiyet Bağlamında Türkçede Atasözleri Ve Deyimler. Turkish Studiens - International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume, 1135.

Öztürk, M. (2015). Vekolînek Derbarê Gotinên Peşiyan Ên Kurmancî De. , hj. 2. Mukaddime, 319-337.

## Agahdarên Zindî

Mehmûdê mislimi hemedî xelê, gundê çort, temen: 45

Seydî xanimê, gundê elîzeran, temen: 62

Îmam Kaplan, gundê qeplên, temen: 45

Hemed Bayadîn Geçgel, gundê til’eynterê, temen: 55

Xeyilê evdî erebo, gundê elîzeran, temen: 50

Hatîce öz, gundê bociyan, temen: 60

Qadirê mislimi xelef, gundê xerêt, temen: 45

Emîn Yavuzer, gundê tilalê temen: 40

Metîn polat, gundê sêtilê, temen: 30

Süleyman ceylaner, gundê tilhutkê, temen: 31

Îbrahîm Sırrı, mi’eser, temen: 55

Ridvan Demîr, gundê giregewrê, temen: 32

Ömer Şahîn, gundê heftrih, temen: 30

Jiyan Yildiztekîn, gundê midêbê, temen: 35

Îdrîs Dînçer, gundê qestûnkê, temen: 45

Eyşa Hemî Hemê, gundê qeplên, temen: 50

SacîraNehsê, gundê axaçiya mezin, temen: 40

Metîn Tuncay, gundê hêcekê, temen: 40

T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiyede Yaşayan Diller Ensitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Bitirme Projesi

# **“Suruç Bölgesindeki Atasözlerinde Kadın Tasviri”**

Hazırlayan:

Abdurrahman Aydoğdu
19721004

Danışman:
Doç. Dr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn 2021